



Bixêrhatî dibistana çandê

Li vir agahdarîyên wergerandî yê li derbarê Dibistana çandê û xebata me hene. Di danûstendina bi me re û di perwerdeyê de zimanê me yê axaftin û nivîsandinê swêdî ye.

Dibistana çandê - ji bo kesên navbera temenê 6 û 22 salî - derfetê dide ku di beşên muzîk, stran, teater (şano), muzîkal, dans, sîrkûs, huner û medyayê de xuliqariya xwe bipêş bixi.

Li vir meraqa te dikare ji bo beşên din yê çandê çêbibe û hevalên nû peyda bikî. Tu dikarî piştî dawîbûna roja xwe ya li dibistanê werî cem me, lê herweha di demên xwe yê vala de jî.



[Yekser biçê ders û veqetandina cîh \(svenska\)](#)

Kursên me

Li cem me dikarî di beşên muzîk, teater, dans, sîrkûs, huner û medyayê de di nav bi sedan kursan (dersan) de hilibijartinek bikî. Kursên me yê ji bo seranserê termînekê heye. Lê herweha kursên kin jî hene. Bihaya kursên ji bo termînekê navbera 300 – 750 kron e. Beramberî vê her termînekê kêmasî 12 ders têne dayîn û tu dikarî li ser perwerda xwe xwedîgotinê bî û tesîrê bikî. Kursên kintir, ji sê ta şeş dersan pêk tên. Bihaya wan navbera 100 – 300 kron e.

Tu yê ku yek ji kursên me yên muzîkê hildibijêrî û enstrûmanek xwe tune ye, dikarî yekî ji embara enstrûmanan ya Dibistana çandê deyn bikî. Em piranîya enstrûmanan deyn didin, heger ku vana li embarê hebin, lê ji bilî bilûr û pîyano (vana nikarin bê deynkirin).

Bêtir agahî li derbarê [mesrefa kursan \(svenska\)](#)

Perwerda me

Perwerdeya li Dibistana çandê di grûpan de pêk tê. Di mijarên muzîkê de hun du yan jî çendîn kes in. Ji bo teater, dans û huner di grûpeke mezintir de cîh digirî. Tu dikarî bi xwe li ser dersên xwe xwedîgotin bî û taserê bikî. Bi tevî mamosteyê/mamosteya xwe hunermendî û teknîka xwe dikarî bipêşve bixî. Di nav grûpê de gelekî hêsan e ku meriv îlhamê bide hevûdû. Ders û perwerde di dema vala de pêk tên, piştî ku roja te ya li dibistanê bidawî bû. **Zimanê dersê swêdî ye.**

Ji bo te yê ku daketîneke fonksiyonî ya wê/wî heye derfet tê dayîn ku li ser bingehê karîn û sertên xwe afirandêrîyên xwe nas bikî. Heta ji dest tê em xebata xwe li gorî pêdivî û daxwazên te adapte dikin.

Mamosteyên me

Mamosteyên Dibistana çandê xwedî tehsîleke bilind in û gelekî bi hewes in. Xwendina wan a pedagojîk û hunerî di asta dibistana bilind de ye . Teknîsîyen, senograf û kostûmjênên me, bi armanca ku berpêşkirin û çalakîyên şagirdan profesyonel be, kedeke baş didin.

Cihên me li nêzî te ne

Perwerde li lokalên me bixwe û li dibistanên li seranserê bajêr pêk tê. Di lokalên me de dik (sehne), techîzatên ronahî û deng, ambareke dekor û kostûman hene. Herweha atolyeyên wêne û şikil (form), salonên dansê, odeyên studîyo û muzîkê hene.



K = lokalên me bixwe

Herweha li zêdeyî 70 dibistanên bajarê Stockholmê xebata me heye.

Cîh veqetîne

Tu yê ku navbera temenê 6 û 22 salî yî û li bajarê Stockholmê dijî dikarî beşdarê kursên me bibî. Ji bo cîh veqetînê diçî [kataloga kursan \(svenska\)](#). Li wir dikarî li gorî mijar, temen, herêm, roja hefteyê û herwekî din lêgerînên xwe filtre bikî.

Têkilî bi me re deyne

Heger pirsên te hebin yan jî ji bo veqetandina cihekê pêdivîya te bi alîkarîyê hebe, [bi me re têkilî deyne](#). Di têkilîyên bi me re û di perwerde û dersê de em bi zimanê swêdî dipeyîvin.

Fermo, li ser medyayên civakî me bişopîne.

Facebook: facebook.com/KulturskolanStockholm

Twitter: [@KulturskolanSth](https://twitter.com/KulturskolanSth)

Instagram: [kulturskolansthlm](https://www.instagram.com/kulturskolansthlm)

#Kulturskolansthlm



KulturskolanStockholm



kulturskolansthlm



KulturskolanSth